
Artuklu Kurdology
e-ISSN: 3062-0236
(21) March 2026

# İkinci Xanî - Xaniyê Duyem Hacî Qadirê Koyî

**Kadri Yıldırım, Avesta, 2016.**
**160 Rûpel, ISBN: 978-605-9082-61-7**




Kerem Engin

https://orcid.org/0000-0002-8339-6092 | kengin_cevizdibi@hotmail.com
Xwendekarê Doktorayê, Zanîngeha Bingolê, Enstituya Zimanên Zindî, Ziman û Edebiyata Kurdî, Bingol, Tirkiye,
ROR ID: https://ror.org/03hx84x94

Dîroka Hatinê/ Submission / Geliş Tarihi
08.01.2026
Dîroka Qebûlê / Acceptance / Kabul Tarihi
24.03.2026
Dîroka Weşanê/Publication / Yayın tarihi
31.03.2026

Nirxandina Pirtûkan / Book Review

Zimanzan, teolog, akademîsyen û sîyasetmedar Kadri Yıldırımê ku di sala 2021ê de wefat kirîye, li ser gelek mijarên zanistî xebitîye ku teolojî, edebîyat, dîrok û werger çend mijarên cuda ne ji qada xebatên wî. Bi zimanê Tirkî û Kurdî ji 20î zêdetir berhemên wî hene. Pirtûka Xanîyê Duyem Hacî Qadirê Koyî (2016) jî ji alîyê Yıldırım ve bi zimanê Kurdî hatîye nivîsîn. Her wîsa pirtûk bi zimanê Tirkî jî bi navê İkinci Xani Hacî Qadirê Koyî ji alîyê Yıldırım bi xwe ve hatîye wergerandin û edîtorîya wê jî ji alîyê Adbdullah Keskin ve hatîye kirin. Yıldırım ev pirtûk bi heman navî di sala 2016ê de bi ISBNya 9786059082617 weşandîye. Ev pirtûk ji alîyê weşanxaneya Avestayê li bajarê Stenbolê hatîye çapkirin. Hem ji hêla zimanê Kurdî, hem jî ji hêla zimanê Tirkî ve 76 rûpel e. Ev pirtûk ji bilî destpêkê li ser çar beşan pêk hatîye. Her wîsa di dawîyê de cih daye jêderên vê pirtûkê jî.

Li gorî agahîyên nivîskarî li ser Koyî di asta pirtûkeke serbixwe de hêşta çi lêlokîn nehatine kirin. Lewma ku ev valahî bê dagirtin, wek têkarîyekê ev pirtûk hatîye nivîsîn. Bi gotina nivîskarî ev pirtûk bi taybetî ji bo Kurdên bakur hatîye nivîsîn da ku Hacî Qadirê Koyî bê nasîn. Nivîskarî pirtûka xwe li ser çar beşan dabeş kiriye. Her beşek jî ji çend sernavan pêk tê. Li vir zehmete ku em hemî sernavên vê pirtûkê behs jê bikin, lewma em dê beşên vê pirtûkê yên sereke û taybetmendîyên wê yên giring li ser rawestin. Nivîskarî di vê pirtûkê de behsa kurtejîyana Hacî Qadirê Koyî û serencama dîwana wî û helbestên wî kirîye. Dîsa ji alîyê şikl û naverokê ve helbest û ramanên wî û dîyardeyên ku di warê welatparêzîyê de li ser Koyî bandor kirine hatine destnîşan kirin. Ez dê bi gelemperî behsê naveroka van beşan bikim.

### Jîyana Koyî

Nivîskar di beşa yekem de li ser pêvajoyên jîyana Koyî radiweste. Balê dikşîne ser wan merhaleyên ku Koyî tê de derbas bûye. Wîsa xuya dibe ku Koyî di destpêka jîyana xwe de hindek zehmetî kêşane. Di heft salîya Koyî de babê wî jîyana xwe ji dest dide. Dayîka wî bi perwerdehîya wî ve eleqeder dibe. Ji ber ku rewşa wî ji alîyê aborî ve nexweş bûye, axa û mezinên Koysenceqê harîkarîya wî dikin. Lewma Koyî di helbestên xwe de xwe dişibîne Hezretî Îsa û dibêje: min ne jin e, min ne mal e, min ne kur e. Her wîsa li gorî agahîyên nivîskarî, Koyî li medreseyên Kurdistanê di lûtkeyeke bilind de perwerdehîya medresê diqedîne. Şêxekî bi navê Nebî Mewlewî li Koysenceqê bi hizaran peyrevên wî hebûne. Amaje pê tê kirin ku li gorî Koyî, vî şêxî dîn ji bo berjewendîyên xwe yên şexsî bikar anîye û kurd xapandine. Lewma ew di derheqê wî şêxî de helbestan dinivîse û wî tawanbar dike. Ji bo vê yekê peyrewên wî şêxî êrişên xwe dibin ser Koyî û qesta kuştina wî dikin. Êdî Koyî dizane ku li Koysenceqê ji bo wî rehetî namîne. Ew diçe Stenbolê û 33 salan li Stenbolê jîyana xwe didomîne û di 80 salîya xwe de diçe ber dilovanîya Xwedê.

### Aqûbeta Dîwan û Helbestên Wî

Nivîskar di beşa duyem de behsa aqûbeta dîwan û helbestên Koyî dike. Li gorî van agahîyan, Koyî hez dikir ku dîwana xwe li Stenbolê biweşîne. Lê ji ber zehmetîyên aborî nikarîye vê armanca xwe bi cih bîne. Dîwana wî li cem Avdirezaq Bedirxan tê muhefezekirin, bes piştî Abdurezak tê sêdaredan, hukûmeta îttihad û teraqî li gel tiştên wî dîwana Koyî jî berze dikin. Li gor nivîskarî cara pêşîn Abdurrahman Saîd wek dîwançeyekê helbestên Koyî li Bexdayê çap dike. Her wîsa Koyî hindek helbestên xwe bi navê ”Xîreta Millî” teslîmî Avdirezaq Bedirxan dike. Yıldırım dibêje: Celadet Bedirxan di kovara Hawarê de wekî “Kilasîkên Me” behsa dîwana Koyî dike û Koyî wekî Xanîyê duyem bi nav dike. Lewma dilê wî jî wekî yê Xanî bi derdê welat disoje. Yıldırım derdixe pêş ku Koyî li Stenbolê têkildarîyê li gel komeleyê şa‘êran dike û dersan jî dide wan şa‘êran. Yıldırım dibêje du nusxeyên dîwana Koyî hebûn ku 800 rûpel bûn. Heke nusxeyek hatibe sotin jî, hîvî heye ku nusxeya din rojekê peyda bibe. Di vê beşê de behsa helbestên Koyî yên di kovar û rojnameyên kurdî de hatîne weşandin jî tê kirin. Rojnameya Kurdistanê piştî wefata Koyî tê weşandin, ev rojname behsa behsa wefata wî dike û her wîsa di rojnameyên kurdî yên cur bi cur de nezîkî nozdeh helbestên Koyî tên weşandin. Nivîskar di vê beşê de tabloyeke helbestên Koyî yên di rojnameyên cîyawaz de hatine weşandin nîşan dide.

Agahîyeke balkêş jî ew e ku Koyî destxeta Mem û Zînê ya aîdî Mîr Elî Bedirxan dixwîne û li ser wê helbestan dinivîse, nivîskar nimûneyên van helbestan jî nîşan dide. Di dawîya vê beşê de behsa sê kedkar û xebatkarên dîwana Koyî tê kirin. Nivîskar dibêje: yek ji wan kesan Abdurrahman Seîd e, helbestên Koyî wekî dîwançeyekê li Bexdayê çap dike, yê duyem jî hevalêkî Koyî yê medresê ye li ser dîwana wî xebateke berfireh bi navê "Hacî Qadirê Koyî" sê bergên dîwana wî amade dike û di salên 70yî de li Bexdayê çap dike. Kerim Şarezayî jî helbestê wî bi navê "Dîwanî Hacî Qadirê Koyî" li Erbîlê çap dike. Weşanxaneya Nefelê jî di nav weşanên xwe de nusxeyeke dîwana Koyî di sala 2004ê de bi alfabeya latînî wekî çapeke dîjîtal dertdixe.

### Ji Alîyê Şikl û Naverokê ve Hizr û Ramanên Koyî

Nivîskar di beşa sêyem de ji alîyê şikl û naverokê ve li ser hizr û ramanên Koyî radiweste. Bi awayekî berfireh berê xwe dide van mijaran jî: Koyî wekî helbestvanekî di qalibê klasik de û di riheke modern de nîşan dide û wî wek pêşengekî helbesta Kurdî ya modern derdixe pêş. Piştî Xanî ji alîyê hizrên welatparêzî ve Koyî di asta duyem de nîşan dide. Dibêje Koyî di helbestê xwe de li ser zanîn, yekîtî û azadîya welat radiweste. Her wîsa di vê beşê de ji alîyê şikl û nezmê jî amaje bi helbestên Koyî tê kirin. Nimûneyên wekî qesîde, xezel, mesnewî, çarîn, takemalik û wecîzeyan wî tên nîşandan.

Di dawîya vê beşê de nivîskar bala xwe dide ser naveroka helbestên Koyî. Amajê pê dike ku Kurd xwedî li zimanê xwe dernakevin, ev rewşe jî bi neyînî bandorekê li ser Koyî dike û wî xemgîn dike. Her wîsa dibêje: Koyî di helbestên xwe de ji bo êkatî û azadîya Kurdan, Ermenî û milletên din wekî mînak nîşan dide. Xaleke balkêş jî ew e ku li gorî agahîyên nivîskarî bi harîkarîya dewletên Ewropîyan li herêma Kurdan avakirina dewleteke Ermenîyan, Koyî xemgîn dike. Lewma axa Kurdan dê bikeve nav sinorên wê dewletê û li nav Kurdan ew dibe sebeba endîşê û Koyî jî di helbestên xwe de vê endîşeyê tîne zimên.

Her wîsa nivîskar balê dikşîne ser dînamîkên dîroka dinyayê, ku gelên bindest bi du şiklan azadîya xwe bi dest xistîye. Yek qelem e, ya din jî çek/şûr e. Koyî bala Kurdan dide ser vê yekê da ku xwe di van herdu hêlan de pêşve bibin. Careke din Yıldırım ji bo perwerdehîya jinê balê dikşîne ser dînamîkên dîrokî û civakî. Dibêje di serdema klasîk de jinê di medreseyan de ji bo mêran mamostetî kirîye. Bes di civaka Kurdan de kiç/keç ji alîyê perwerdehîyê ve paşve maye. Ji bo vê çendê jî hedîsên Pêxemberî ewên di helbestên Koyî de hatine iqtîbaskirin wekî nimûne nîşan dide. Her wîsa ew melayên dibêjin bila keçik nexwînin wan bi hedîsên Pêxemberî ve hişyar dike. Yıldırım derbarê vê mijarê de behsa meseleyek wîsa jî dike û balê dikşîne dîrokê ku du qismên şêxan hebûne. Yek ji wan şêxan, Îslamê bi awayekî rast ji bo gelî dibêjin. Yên din jî ji bo berjewendîyên xwe yên şexsî dîn bi kar anîne. Lewma Koyî gazindê ji Kurdan dike û dibêje li pey wan şêxan neçin û Kurdan hişyar dike.

### Paşxaneya Hizrên Koyî

Nivîskar di vê beşê de balê dikşîne ser paşxaneya hizrên Koyî yên welatparêzî û rewşenbîrîya wî. Amaje bi wan bûyerên ku karegirî li ser Koyî kirine dike. Ji bo paşxaneya hizrên Koyî bajarê Stenbolê, malbata Bedirxanîyan û Xanî û Mem û Zîna wî wek sê dînamîkên sereke tên dîyarkirin. Ev hersê dînamîk di heman demê de rûdanê li ser şexsîyeta Koyî ya edebî û rewşenbîrî jî dikin. Bi kurtasî Yıldırım dibêje: Ji bo neteweperwerîya Koyî mala Bedirxanîyan roleke giring digire. Koyî hem dersan dide zarokên Bedirxanîyan, hem jî li gel wan dikeve nav xebatên edebî û rewşenbîrî. Bajarê Stenbolê ji bo tesîskirina bingehên netewetîyê navendeke giring bû, lewma Koyî Stenbol ji bo xwe kire cihê xebat û bizavê. Bi taybetî Mem û Zîn tesîreke kûr dixe ser Koyî. Ev hersê dînamîk karîgerîyeke zêde li ser Koyî dikin. Di dawîya vê beşê de nivîskar balê dikşîne ser mijarên hevpar yên Xanî û Koyî ku Koyî di helbestên xwe de înane zimên. Ji bo rewşa Kurdan ya sîyasî Xanî çi tesbît kiribe Koyî jî heman tespîtê dike û gotinên xwe dibêje. Li gorî nivîskarî ji alîyê comerdîyê ve Kurd wekî Hatemê Ta'î, ji

alîyê cesarete ve jî wekî Rûstem in, her wîsa Koyî jî di helbestên xwe de Kurdan dişibîne wan kesan.

Yıldırım dîyar dike ku egera serekî ya paşvemana Kurdan neêkatî û nehevrêyîya wan e. Ji bo vê yekê jî ji Xanî û Koyî helbestan îqtîbas dike. Her wîsa dibêje li gorî Koyî jî heke Kurdan di nav xwe de êkatîyek ava kiriba û li dûv pêşengekî çûbana di navbera kumsoran de perişan nedibûn. Tê nîşandan herdu helbestvan di helbestên xwe de îfade dikin ku hemî millet xwedî kitêb in û Kurdan jî bêkitêb îtham dikin. Herdu helbestvanên Kurd di helbestên xwe de bi eksê vê hizrê helbestan vedihonin û ji bo çareserîya vê rewşa xirab rêkek nû jî nîşan didin.

## Encam

Yıldırım di vê pirtûkê de behsa jîyan û helbestên Koyî dike. Koyî di qalibê edebiyata klasîk de helbestên xwe nivîsîne, hizrên xwe jî bi awayekî nûjen û rewşenbîrî anîne zimên. Di vê çarçoveyê de Koyî behsa zulf û xalên dîlberê nekiriye, lewma mijarên edebiyata serdema Koyî û serdemên klasîk wekhev nebûn. Ew li ser pirsgirêkên civaka Kurdan yên sîyasî û civakî rawestîyaye û çareserîya wan jî bi awayekî aktûel û rewşenbîrî di helbestên xwe de destnîşan kirine.

Li gorî me ev pirtûk di qada xwe de cihekî vala tijî dike. Lewma Kurdên bakûr zêde pêwîstî pê heye ku pêşengekî edebiyata Kurdî ya modern û kesayetekî wekî Koyî binasin û derheqê wî de bibin xwedî agahî. Her wîsa ev pirtûk ji bo Kurdên li herêmên din jî dê bibe rênîşander û ilhama hizr û rewşenbîrîya Koyî dê sûd jê bê wergirtin. Ji bo lêkolînerên edebîyata Kurdî û xwendekarên beşên kurdolojîyê jî dê bibe çavkanîyeke orîjînal.

Di encamê de dîyar dibe ku Koyî ilhama welatparêzîyê ji Xanî wergirtîye. Ji bo ku peyama Xanî ragihîne roja me roleke karîger bi cih anîye. Koyî di serdema modern de careke din hizrên Xanî bi rih dixe. Lewma bi Xanîyê duyem hatîye bi navkirin. Ji alîyê qewareyê ev pirtûk biçûk e, bes ji alîyê naverokê ve agahîyên giring hatîne danê. Di beşa çaran de nivîskarî hindek mijar dubare kirine, lewma me jî carek din beshê van mijaran nekir.

## Çavkanî | Reference

Yıldırım, K. (2016). Xanîyê Duyem Hacî Qadirê Koyî. Avesta